# Di helbestên Mela Ehmedê Zinarexî de Hêmanên naverokî*

ABDURRAHMAN ADAK

Ji aliyê naverokê ve di dîwana helbestvanekî klasîk de tema û mijarên curbicur ên wek dîn, tesewif, evîn, siruşt, pesn, şîn, hikmet, felsefe cih digirin ku di edebiyata Kurdî ya klasîk a serdema mîrektiyan de jî temayên sereke ên helbestê ev in. Hin ji van temayan mehsûlên hest û hizrên helbestvan in, hin ji wan jî rengvedana rewşa siyasî, civakî, dînî, zanistî û çandî ya serdema helbestvan in. Wek taybetiyeke karakterîstîk a dîroka edebiyatê, di dîroka edebiyata Kurdî de jî guherîna dem û serdeman guherîna di tema û mijaran de jî bi xwe re aniye û di serdema piştî mîrektiyan de di temayên navborî de hin guherîn çêbûne. Ji aliyekî dî ve divê bê bibîrxistin ku hin ji mijarên van temayan ji aliyê gelek helbestvanan ve bi firehî hatine bikaranîn û di kevneşopiya edebî de der heqê wan temayan de komek metnên edebî derketine meydanê ku di termînolojiya edebiyatê de temayên bi vî rengî wek cureyên edebî tên binavkirin. Di vê xebatê de em dê wek helbestvanekî hevçax ku di qonaxa herî dawî ya dîroka edebiyata Kurdî de jiyaye, ji aliyê tema, mijar û cureyên edebî ve li ser naveroka helbestên Mela Ehmedê Zinarexî rawestin û li ser hevbeşiya wî bi standarda serdema mîrektiyan, rengvedana rewşa siyasî û civakî ya serdema wî di helbestên wî de û orjînalîte û xweseriya wî ya naverokî analîzekê bikin.

* Ev lêkolîn, di çarçoveya projeya bi navê “Mela Ehmedi Zınarehî’nin Divanının Tahkik ve Tahlili”, li Zanîngeha Mardin Artukluyê di bin banê Koordînatoriya Projeyên Zanistî de bi jimareya MAÜ-BAP-16-EF-18an hatiye amadekirin.

**1. Hêmanên Naverokî yên bi Standarda Kevneşopiyê re Hevbeş**

**1.1. Temaya Dîn û Cureyên Tewhîd û Ne'tê**

Eger temayên dîwana Mela Ehmed bên rêzkirin, temaya dîn wek standarta nerîta vê edebiyatê dê di serê hemûyan de cih bigire. Mela Ehmed ji hemû temayan zêdetir û berî hemûyan li ser temaya dîn rawestiyaye. Her çiqas helbestvanê me wek helbestvanên berê di serê dîwana xwe de ji bo Besmele, Hemdele û Selweleyê helbestên serbixwe nenivîsîne jî, qet nebe her sê bendên pêşî yên dîwana xwe ji bo van mijaran terxan kiriye. Zinarexî di helbestên xwe yên dînî de (*Şîreta Musulmana, Hikmeta Çêbûna Însanî, Însanê vê Dunyayê, Şi'ra Heval Digel Komê Teyra, Şîreta Ehmed Nas e li Şêxmûsê Hemo, Tarîxa Hicrî weya Umrî*) bi piranî cih daye mijarên wek şîretên dînî, tirsa ji Xwedê, îbretgirtin û hikmeta afirandinê. Eger em ji aliyê cureyên dînî-edebî yên standart ve li dîwana Mela Ehmed binêrin, di dîwana wî de ji van cureyan du heb hene. Helbesta wî ya bi sernavê *Hewar û Xeberdana Ehmed bi Rebbê Wî re* ji cureya munacatê û *Şi'ra ser Işqa Muhemmed, Şîkayeta bal Resûl ve* jî ji cureya ne'tê ne. Mela Ehmed di munacata xwe de xîtabî Xweda, di ne'ta xwe de jî xîtabî Cenabê Pêxember kiriye. Helbestvanê me di van helbestên xwe de ji hestyariyê zêdetir aqil, ji lîrîzmê zêdetir realîzm derxistiye pêş û şûna ku wek helbestvanên berê li ser mijarên nezerî yên wek wehdetu'l-wicûdê raweste; li ser dûrketina însanan ji exlaq û ehkamê Îslamê rawestiyaye.

**1.2. Fexriye**

Xaleke dî ya ku helbesta Mela Ehmed bi nerîta edebî re hevpar dike, şanaziya bi hunera xwe ye ku ev yek di termînolojiya helbesta klasîk de wek "fexriye" hatiye binavkirin. Mela Ehmed di helbestên *Şi'ra Hicretê, Hinek Halê Ehmed in, Qîra Rohilat* de cih daye beşên fexriyeyê û çawa ku di nimûneya jêrîn de tê dîtin bi hêz û şarezatiya xwe ya edebî şanazî kiriye.

*Di şi'rê da cîhangîr im*
*Di nezmê de gelek jîr im*
*Hinek tiştê bûrî'l bîr im*
*Yeqîn fedla îlahî ev* (Dîwan, *Hinek Halê Ehmed in*)

**1.3. Evîn**

Evîn temayeke bingehîn û berbelav a edebiyata klasîk e ku di nerîta vê edebiyatê de mezmûn, telmîh û teşbîhên wê yên standart saz bûne. Mela Ehmed wek helbestvanekî realîst di helbestên xwe de zêde cih nedaye vê temayê. Dî dîwana wî de bi şêweya klasîk tenê helbesteke lîrîk û evînî heye (*Şi'ra işq û evînê*). Di vê helbestê de şopa Melayê Cizîrî aşkera ye:

**Melayê Cizîrî:**

*Hêvî û tewqe dikim ez ji xudana heşemê*
*Wê nigar û senem û padişeh û muhteşemê*

*Mûyekî ez ji te nadim bi dused Zîn û Şîrînan*
*Çi dibit ger tu hesêb kî mi bi Firhad û Memê*

**Mela Ehmedê Zinarexî:**

*Çarê nakê qet li me tiştek li vê 'erda henê*
*Hêvî yû tewqa dixwazin em ji Barî keremê*

*Ev evînek pur giran e daye cismê me eser*
*Lewra feryadê me tên herwekî Ferhad û Memê*


Çawa tê dîtin ev helbesta Mela Ehmed nezîreyeke helbesta Melayê Cizîrî ye. Lewra Mela Ehmed helbesta xwe bi rêbaza modelwergirtinê bi heman kêş, qafiye û mijarê li ber helbesta Melayê Cizîrî nivîsiye.

**1.4. Bihariye**

Mela Ehmed di sê helbestan de (*Şi'ra Biharê, Şi'ra Bayê, Bulbulê Baxê Laleş*) kêfxweş û geşbîn e. Ew di van helbestan de li ser xweşiyên biharê û bilbilên gulistanê rawestiyaye ku ev helbestên wî dikevin kategoriya cureya bihariyeyê. Mela Ehmed vê carê jî Feqiyê Teyran şopandiye. Di helbesta Mela Ehmed a bi ser navê *Şi'ra bayê* de bandora *Ey avê av* a Feqî aşkera ye. Mela Ehmed di vir de cih daye navê Feqî jî.

**Feqiyê Teyran:**

*Ey av û av, ey av û av*
*Ma tu bi 'işq û muhbet î*
*Mewc û pêlan tavêy belav*
*Bê sekne û bê rahet î*



*Feqiyê delal ez 'aşiq im*
*Çi b'kim ku ez ne natiq im*
*Me'mûrê emrê Xaliq im*
*Ah û fixanê muhbetê*

**Mela Ehmedê Zinarexî:**
*Ji vî bayî ji vî bayî*
*Gelek mame 'ecêbmayî*
*Dikê 'ewr û dikê sayî*
*Şev û rojê nasekinê*

*Cewab didê ez ne dîn im*
*Bi_emrê Rebbi'l-'Alemîn im*
*Ji bo ceza li we bi_kîn im*
*Lew me ezyet ji we re_anî*

**1.5. Xemgînî û Bedbînî**

Her çiqas Mela Ehmed di bihariyeyên xwe de kêfxweş û geşbîn e jî, di komek ji helbestên xwe de xemgîn, carinan jî bedbîn e. Ew di helbestên xwe yên bi sernavê (*Şi'ra Derda, Şi'ra Ser Dilê Jar û Yexsîr, Şi'ra Ser Felekê û Kîna Wê, Şi'ra Ser Qehrê, Ş'ira Ser Firqetê, Şi'ra Ser Wesletê*) li ser temayên temayên hevpar ên edebiyata klasîk ên wek êş, izdirab, firqet, wuslet û gazina ji felekê rawestiyaye.

**2. Rengvedana Serdemê di Naveroka Helbestên Zinarexî de**

**2.1. Mijarên Dînî-Siyasî**

Çawa ku li jorê jî hat gotin temaya dîn, temayeke sereke ya helbestên Mela Ehmedê Zinarexî ye. Lêbelê naveroka vê temayê li cem wî hinekî guheriye. Her çiqas ji aliyê şîretên exlaqî-dînî ve di navbera wî û helbestvanên berê de hevbeşî hebe jî -çawa ku li jorê li ser vê yekê hat rawestan- di temaya dîn de perspektîfeke wî ya nû jî heye ku ev yek ji bo rengvedana serdemê di helbestên wî de nimûneyeke girîng e. Lewra hin helbestên Mela Ehmed ên dînî (*Were Qur'an Were Qur'an, Şi'ra Cîhad û Mucahede, Şi'ra ser işqa Muhemmed*) bi rewşa siyasî-civakî ya Mislimanan ve girêdayî ne. Mela Ehmed di van helbestan de daxwaza xebatê ji bo serweriya Qur'an û Sunnetê dike, lawaziya civakî ya di warê baweriyê de û pirsgirêkên civakî û çandî yên ku ji têgihîştineke şaş a dînî derdikevin holê tîne zimên. Ev hizr li cem Mela Ehmed ewqas girîng in ku wî helbesta pêşî ya dîwanê (*Şîreta Musulmana*) ji bo vê temayê terxan kiriye. Ev neqerata jêrîn a bicoş jî hest û hizrên wî yên di vê mijarê de gelekî xweş îfade dike:

*Were Qur'an were Qur'an*
*Bikin qurban te rûh û can*

Ev hizrên Mela Ehmed bi mîzaca wî ya têkildarî rewşên siyasî dikarin bên îzahkirin. Ev yek di helbesta *Qîra Rohilat* de li ber çavan e. Helbestvan, ev helbesta xwe di çarçoveya siyaseta navneteweyî de rasterast ji bo rewşa siyasî ya Rojhilata Navîn terxan kiriye. Di encamê de vê têkildariya wî ya bi rewşên siyasî re, bi xwe re hizreke dînî-siyasî jî aniye.

**2.2. Hizra Kurdî**

Mela Ehmed di komek ji helbestên xwe de jî (*Şi'ra Hicretê, Hinek Halê Ehmed in, Şi'ra ser Medhê Şahê Berzan Digel Nesla Wî*) wek rengvedaneke serdemê li ser hizra neteweyî ya Kurdî rawestiyaye. Mela Ehmed di van helbestan de hizra neteweyî û ya dînî cêwî dibîne û kesên wek Ehmedê Xanî, Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî û Mela Mistefa Barzanî ji bo modela xwe wek rêber pêşkêş dike (Şiêra Hicretê). Wek piraniya helbestvanên Kurd ên klasîk Mela Ehmedê Zinarexî jî di warê xwedîderketina zimanê Kurdî de li pey şopa Ehmedê Xanî çûye:

B*i* 'Erebî *ez* karim çê kim
D'bê zengîn im ez çi jê kim
L*i* feqîrê xwe sedeqê kim
Çikû qa'îdê xêrê ev

Kurmancî d'bêj ez feqîr im
Bê dewlet û bê 'eşîr im
Gelek kûz im û xemgîr im
Êgir d'berdê dilê me ev

Mela Ehmed di cihekî de jî aşkera behsa destpêka Mem û Zînê kiriye ku hizrên Xanî yên neteweyî tê de derbas dibin:

Serê Mem û Zînê b'wxîne
Wur fehm bike û bibîne
Li ser me ew pir hezîn e
Ji bo me her heqîqet ev

Mela Ehmed di helbesta *Qîra Rohilat* de ku ji bo problemên Rojhilata Navîn terxan kiriye, wek pêkhateyeke Rojhilata Navîn bi taybetî cih daye gelê Kurd û siyaseta ku li dijî Kurdên Iraqê hatiye meşandin, bombeyên ku hatine avêtin, gundên ku hatine xirakirin, komkujiyên ku li Helebçe û Qel'adizê hatine kirin rexne kirine:

Deccalê wa Seddam e
L*i*_wa kirya qetla'ame
Vî qasî j*i*_bona wa me
Rehm qey l*i*_qelbê wî heye

Çawa tê dîtin, hizra neteweyî ya Mela Ehmed, di çarçoveya rengvedana serdemê de hizreke şênber û birêkûpêk e. Hizra wi ya Kurdî ji aliyekî ve bi bûyerên şênber ên siyasî ve têkildar e, ji aliyekî ve di vî warî de rêberên wî hene, ji aliyekî ve jî bi hizra dînî re cêwî ye. Digel vê jî divê bê gotin ku wî di dîwana xwe de kesayetekî li dijî "cêwî"tiya Kurdî-Îslamî jî bi bîr aniye ku ew jî Cegerxwîn e. Ji vê jî tê fêmkirin ku perspektîfên wan ne yek jî bin, kesayetên neteweyî li cem Mela Ehmed xwedî nirx in.

**2.3. Tenz: Rexneya Civakî**

Temayeke helbesta Mela Ehmed rexneya civakî ye (ne daşorîna kesan/hicwiye) ku di edebiyata Farisî de rexneya bi vî rengî wek "tenz" hatiye binavkirin. Lêbelê rexneya wî ya civakî tenê ji bo çînên dînî ne ku ew jî sofî, mela û şêx in (*We'z û Sohbeta Sofiya, Şi'ra ser Mela)*. Wî şaşiyên ku di nav van çînan de tên dîtin tesbît kirine û di vî warî de gilî û gazinên xwe anîne ziman. Bo nimûne helbesta xwe ya bi navê *We'z û Sohbeta Sofiya* ji bo hin mirîdên şêxan ên ku ji eşîrên Didêran, Hesinan û 'Elîkan ku sê eşîrên herêma Hezexê ne, terxan kiriye. Mela Ehmed di vê helbestê de baweriyên wan ên bi şêxan re têkildar nirxandine û xeletî û şaşiyên wan ên dijberî baweriya Îslamê destnîşan kirine. Mela Ehmed di encamê de ji bo van şaşiyan wek alternatîf û bersivekê serî li hizrên şêxê wan Şêx Seydayê Cizîrî daye û bi vî awayî xwestiye ku ew ji şaşiyên xwe dûr bikevin. Mela Ehmed di helbestên xwe yên bi sernavê *Şi'ra Cahilê Pur Nezan, Şi'ra Ser Pera, Şi'ra Ser Jina* û heta astekê di *Şi'ra Ser Dosta û Dostaniyê* de jî li ser şaşiyên di nav gel de tên dîtin radiweste.

Mela Ehmed di vî terzê helbestê de -wek gelek xalên dî- ketiye bin bandora Seyîd Eliyê Findikî. Çawa ku Seyîd Elî li ser mijarên wek şîret û nesîhet, derxistina hezjêkirina dinyayê ji dil û amadehiya ji bo roja piştî mirinê, nezanî, rexneya şêx, mela û sofiyên ku ji heqîqetê dûr ketine û xurafeyên nav xelkê rawestiyaye, Mela Ehmed jî li ser heman mijaran rawestiyaye:

**Seyîd 'Eliyê Findikî:**
Niviştêkî dixwazim ez j' sewêl ra
Hinek pez hinkî çêlek hinkî ga ne

J' mehînê ra dixwazim yêkî başqe
Dilê min gelkî pê va ye cuwan e

**Mela Ehmedê Zinarexî:**
D'bê mehînam winda bû
Bêje niha l*i* kû da bû
L*i* ber avê çêlek çûbû
Dibakê me j*i* te divê zû
Cih de b*i* bejê de avêt

Bêguman ji ber ku em bi saya van helbestan der heqê civaka helbestvan de hin zanyariyan bi dest dixin, ev helbest gelekî girîng in. Her weha perspektîfa rexneya civakî nirxên van helbestan bilindtir dike. Ji aliyekî dî ve her çiqas di serdema mîrektiyan de di cureya tenzê de hin helbest hene jî, ev tenz ne di çarçoveya xurafeyên di nav terîqetan de ne. Loma ev tenzên Mela Ehmed ji bo dîroka edebiyata Kurdî ya klasîk nû û orjînal in.

### 2.4. Sê Şêxên Payebilind: Şêx Se'îd, Şêx Seyda û Şêx Nûrullah

Yek ji temayên girîng a helbesta Mela Ehmed kesayetên dînî yên payebilind û bi qîmet in. Sê heb ji van kesan şêxên mutesewif in ku di sedsala XXem de di nav Kurdên Bakur de bandoreke wan a şênber çêbûye. Yek ji van Şêx Se'îdê Pîranî ye ku wek rêberê serhildana 1925an tê naskirin. Mela Ehmed der heqê wî de mersiyeyek (*Şi'ra Şêxê Ezîz*) nivîsiye. Ji van şêxan ê duyem Şêx Seydayê Cizîrî (w. 1977) ye ku di serdema xwe de li nav Kurdên Bakur nufûzeke wî ya zêde çêbûye. Şêx Seyda, di heman demê de yek ji seydayên Mela Ehmed e û şêxê malbata wî ye jî. Mela Ehmed, nameyeke menzûm ku ji Şêx Seyda re şandiye (*Şi'ra Seyda Muhemmed Se'îd*) di dîwana xwe de bi cih kiriye û tê de pesnê wî daye. Şêxê sêyem jî kurê Şêx Seydayê Cizîrî Şêx Nûrullah (w. 1985) e ku di nav gel de bandora wî zêde û di nav şêx, mela û rewşenbîrên Kurdan de jî îtîbara wî bilind bû. Çawa tê dîtin kesayetên di civakê de xwedî bandor di helbesta Mela Ehmed de cih girtine û bi vî awayî helbesta Mela Ehmed ji bo zanyariyên şênber ên civaka xwe bûye ayîneyek ku ev yek rengvedana civakê di helbestên wî de bi zelalî nîşan dide.

## 3. Xweseriya Zinarexî di Hêmanên Naverokî de

### 3.1. Vêgêrana Bûyera Se'îdê kurê Cubeyr Digel Heccacê Zalim

Yek ji xweseriyên helbesta Mela Ehmed helbesteke wî ya di cureya vegêran/hîkayetê de ye (*Qisseta Se'îdê kurê Cubeyr digel Heccacê Zalim*) ku bi aliyê xwe yê dîdaktîk derdikeve pêş. Mela Ehmed di vê helbestê de cih daye berxwedana sehabiyê Cenabê Pêxember Se'îdê kurê Cubeyr li dijî Heccacê Zalim û xwestiye ku alimên îro jî kesên wekî Se'îdê kurê Cubeyr ji xwe re bikin model, kirinên wan di jiyana xwe de jî bi cih bînin û ji serboriya wan îbretê bistînin. Di çarçoveya zanyariyên me de, ji ber ku ev helbest di mijara Se'îdê kurê Cubeyr û Heccacê Zalim de vegêrana yekem e, wek taybetiyeke xweser a helbesta Mela Ehmed derdikeve pêş.

### 3.2. Otobiyografî

Di dîwana Mela Ehmed de, yek ji helbestên bi kesan ve girêdayî di kategoriyeke cuda de ye. Lewra ev helbest otobiyografiya wî bi xwe ye. Mela Ehmed di vê helbesta bi sernavê "*Saxbûna Ehmed*" de bi awayekî dîdaktîk û berfireh jiyana xwe ya zaroktiyê, dê û bavê xwe, mirina birayê xwe, medreseyên ku perwerde tê de dîtine û cihên ku lê wezîfe kirine beyan kirine. Destpêka vê helbestê weha ye:

Hezar neh sed sih û heft
Hat'ne vê dinya zehmet
Rehmetiyê bavê me
Navê me danî Ehmed

Di çarçoveya agahiyên berdest de, di serdema mîrektiyan de ji aliyê helbestvanan ve di cureya otobiyografiyê de helbest nehatine nivîsîn. Loma ev helbesta Mela Ehmed jî wek orjînalîte û xweseriyeke wî ya di warê hêmanên naverokî de derdikeve pêş.

**3.3. Simatiye**

Mela Ehmed ji bilî bihariyeyên xwe di helbesteke xwe ya dî de jî (*Sifra Xwarinê*) kêfxweş û geşbîn e. Dikare bê gotin ku kêfxweşî û geşbîniya wî di vê helbestê de gihîştiye lûtkeyê. Ew helbest li ser xwarinan hatiye nivîsîn ku di edebiyata klasîk de helbestên bi vî rengî wek "simatiye" tên binavkirin. Mela Ehmed di vê helbestê de menûyeke li gor tama devê xwe teswîr kiriye û xwarinên wê menûyê yek yek jimartine. Taybetiyeke vê helbestê ew e ku tê de çanda xwarinên herêmî jî dikare bê şopandin. Bo nimûne di helbestê de wek çandeke herêmî behsa birinca du gundên Hezexê (Fîl û Hespist), çaya qaçax û sîrika koçerên Kiçan hatiye kirin. Ji ber ku bi awayekî giştî di edebiyata Kurdî ya klasîk de nimûneyên cureya simatiyeyê kêm in, ev wek temayeke orjînal a naveroka helbesta Mela Ehmed derdikeve pêş.

**Encam**

Di vê lêkolînê de em wek helbestvanekî hevçax ku di qonaxa herî dawî ya dîroka edebiyata Kurdî de jiyana xwe borandiye, ji aliyê tema, mijar û cureyên edebî ve li ser naveroka helbestên Mela Ehmedê Zinarexî rawestiyan. Mela Ehmed ji aliyekî ve di nav standarta nerîta edebî de maye (temaya dîn û cureyên tewhîd û ne'tê, fexriye, evîn, bihariye, xemgînî û bedbînî), ji aliyekî ve rewşa siyasî û civakî ya serdema wî rengên xwe dane helbestên wî (mijarên dînî-siyasî, hizra Kurdî, tenz, şêxên xwedî bandor), ji aliyekî ve jî di hin cureyên edebî de (vegêrana bûyera Se'îdê kurê Cubeyr digel Heccacê Zalim, otobiyografî, simatiye) jî xwediyê xweseriyekê ye. Bi vî awayî paralelî kesayetiya wî ya edebî, naveroka dîwana wî ji aliyê tema, mijar û cureyên edebî ve dirûvek girtiye. Wek gotina dawî dikare bê gotin ku Mela Ehmed ji lîrîzmê zêdetir, helbestvanekî realîst û dîdaktîk e; di çarçoveya rengvedana serdemê de helbestvanekî siyasî, civakî û rexnegir e û herweha xwediyê hin cureyên edebî yên xweser e. Ew ji aheng, estetîk û hunera helbestê zêdetir, di tema, mijar û cureyên edebî yên helbestê de serkeftî ye. Aliyê wî yê hizrî ji aliyê hunerî bihêztir e.

# Masûmiyet

ALİ KARADENİZ

Çend gotinên bêguneh min xwest bêjim ji te ra
Lê ez tirsiyam tu pê li hinekan xe
Ez tirsiyam masûmiyet xerabibe
Û ez jê geriyam

Ji min mepê êdî
Ezê berê xwe nedim te
Ezê nebêjim kevir hişk û roj dibiriqe
Ezê nebêjim ax diwelide bi tovê çê
Bira ji yek zikî dernakevin êdî

Xaniyên bêkilît ezê çêkim
Ezê nerûnim li bin siya tu daran
Li ber bayê stranekê ezê herim
Di toqa stûyê kebokek çolê da ezê xwe hilînim
Ezê nehêlim şîn bê girtin
Mîna bijankekî ezê bikevim